

Gilî û Gazin: Taktikêk Ji Bo Bê Qawetan

Welat Ay*, Nûkhet Sirman**

Dema me lêkolina li Mersin kir, em bi malbatên ku zarokên xwe dişînin dibistanêre axivin û me dit ku gilî û gazin perçeyek ji jiyîna dibistanê ya girîng e. Ji jiyîna dibistanê mebest ew e ku : li dibistanê çî dibe û li serê çawa tê axaftin û çawa tê dîtîn. Me dît ku axaftina li ser dibistanê rê li ber hin têtikilyên civakî û malbatî ku li serê nayên axaftin vedike. Ji ber vê yekê konteksta perwerdehiyê dibe cihê tekiliya ku li serê bi balkêşî bê xebitandin. Lêkolînêr jî dibe perçeyek vê cihî û datayên ku me berhevkeriyê jî têtikilyên me yê ku me bi malbate re avakiriyê û ji hevdiîtinên me yên kum e li malê kiriyê pêk tîn. Hebuna me ya li wir û pirsên me rê li ber gilî û gazinên li ser malbatê , dibistanê, mamosteyan, gerîndeyan, hevalên polê, jin û mêr û xisiman vekir. Datayên ku livira niha em ji we re pêşkêş dikin ji analizê yekemin ê piştî çar meh ji ser lêkolina li Mersinê re derbasbûyê pêk tîn.

Hemu kes di derbare hev û din de gilî û gazinan dikir. Niha em ê kî li ser kî û çawa gilî û gazinan dikir ji wî peşniyarek kin bidin.

* Esmer bi mêtê xwe re, bi tiyê xwe re û bi xezûrê xwe re diji. Esmer ji ber ku mêtê wê hemû berpisiyariya perwerdehiya zarokan daye ser milê wê, ji mêtê xwe gazinan dikir. Li gora angaştê wê ji ber ku mêtên Kurdan wekî mêtên Tirkên bi zarokên xwe re eleqeder

* Boğaziçi Üniversitesi, Sosyoloji, Yüksek Lisans.

** Boğaziçi Üniversitesi, Sosyoloji

nabin, zarokên Kurd cahil dimînin. Ew difikire ku jiyana malbata mezin rê li ber serkeftina zarokan a dibistanê digre.

- * Mêrê Esmerê, Evdila , ji ber ku bave wî şuna wî bişîne dibistanê wî daye şixulandin der haqê bave xwe de gazinan dike û balkêşiya zarokên xwe dikşîne ser dibistanê ku di pêşerojê de weki wî di tariya sibê de hişyar nebin û neçin kar. Li ber viya Evdila li malê gilikirinê weki ixbarê bikartîne. Di malê de neh zarok hene û Evdila ji zarokan dixwaze ku kî spartekên xwe çêneke bê gilî kirin.
- * Gökhan ji mamosteyê keça xwe gazinan dike ji ber ku zêde spartekan dide keça wî. Gökhan difikire ku ev gilîye ji bo avakirina şana xwe dike. Gökhan ji ber ku mamoste pozê xwe zêde dike nav karê mala wî gazinan dike û gazinan ji bo şan û şerefa xwe dike. Li ber vî Gökhan dibêje ku mamoste tenê ji bo pera lêdigere û dibistanê weki makineya pera dibîne. Ew ji ber ku malbatên Tirk mamaoste çî dixwaze pêk tînin, acis dibe.
- * Li aliyê din, jina Gökhan, wek î Esmerê, ji ber ku mêrê wê zêde alikariya dibistana keçika wan nake ji mêrê xwe gazinan dike. Ew ji midaxeleya malbata Gökhan ku ciranên wan in gazinan dike. Mamosteyê keçika wan mêr e û ji ber vê yekê Xecîce difikire ku mêr li ser hinek mijaran bi hev û din re bêtir rihet diaxivin. Lê bêlê ji ber gazinên mêrê xwe ew çûye ba mûdür û gilî kiriye ku zêde spartk tên dan, mixabin tu encam jê negirtiye.
- * Xisna, ji ber ku mêrê wî ji şevqê heta nivê şevê dişixule bi tena xwe bi dibistina zarokên xwe re mijul dibe. Ew dixwaze ku mamoste gilî bike ji ber ku mamoste di der haqê pêşveçunên Kurd û zimane Kurdî de nexweş dipeyive û mijarên siyasî tîne polê. Wê ev mesele bi ciranên xwe re ji parvekiriye, lê bêlê ciranên wê ji tîrsa heke mamoste gilî bikin dê ji bo serkeftina zarokên wan a dibistanê nebaş bibe gilî nekirine.
- * Ji aliyê din, Reşat, ji bo heman mijarê ji gerinende re gilîye xwe kiriye. Reşat zarokên xwe ji bo perwerdehekî çêtir xwestiye bişîne dibistanekî derveyê mehelleya ku zêdetir Kurd dijîn. Lê bêlê zarok nexwestine li wir bisekinin û vegeyriyane dibistana mahellê.
- * Mamosteyê Mizgîn jê dipirse ku çima ew bêmad e. Ew ji mamosteyê xwe re dibêje ku çend hevalên wê yên polê dev ji dibistanê berdane û çûne serê çiyê. Mamoste aciz dibe û ji Mizgîn re dibêje xebatin xwe yê dibistanê bidomîne û teroristan weki hevalan nebîne. Ev yek Mizgîn aciz dike û wê ji xebatên wê dût dixê. Ya dawîn, mamoste Mizgînê ji malbata wê re gilî dike û balkêşiya malbatê dikşîne ser keçika wan ku hayê wan jê hebe.

- * Ulku, mamosteyê ku dest diavêje ruyê keçika wê ya çardeh salî gili dîke û ji mamoste re gotiye ku mirovên ciwan ji tiştê wiha heznakin. Mamoste xwe pê re acis kiriye û gotiye ku keçika wê mamosteyek ciwantir dixwaze. Ji ber vê yekê Ulku dibêje ku gili kirin fedê nake.
- * Berivan jî difikire ku gili tu guherînek çê nake. Li dibistana wê ji ber ku mamosteyekî taciza zayendî li xwendekarekî kiriye du hefte hatiye dûrxistin lê belê piştî dûrxistina du hefteyan bi xelata alikarê gerînde vegehiyaye.

Wekî ku ji bûyerên li jor jî tê ditin di konteksa dibistanê de gili dibe nîqaşên zayend û zayendîtîyê, malbatê, zewacê, etnîsîteyê. Jin û mêr di derbarê hev û din de de ji lêkoliner re gili û gazinên hev û din dikin. Bi vî hawayê dixwazin hêzek zanistî ji lêkoliner bigirin. Bi vî hawayê tiştên şerm tînin qebûl kirin wekî bûkên muemeleyên di malbatên mezin de dibînin, , tînin ziman. Berivan, keçek şazdeh salî ye, tacizên zayendî yê li dibistanê ku qet di nav malbatê de nehatiye axaftin anî zimên. Bi vî hawayê kesê ku di nava malbatê de pir zêde nikare bi xwe, bi saya lêkoliner fikr û ramanên xwe yê heta niha nehatina axaftin tînin zimên. Ji ber vê yekê lêkoliner dibe warekî ku giliyên der haqê kesên herî xurt (piranî mêr) were ziman. Bi saya serkeftina zarokan a dibistanê di nava malbatê de kesên bêhêz dikarin vê newkheviyê bînin zimên.

Ne tenê zayend, malbat û zewac jî bi saya gili û gazinan tînin axaftin. Cudatîya etnik di konteksta perwerdehiya Tirk de (ê din) nayên axaftin di navbera konteksta dibistanê de bi hawayekî meşru tê nqaş kirin. Ji ber ku etnîsîte li Tirkiyê di warê mafê welatîtiyê de giring nayê ditin, mirov dikare cûdakariya etnikî tenê di gotina wekhevî û mafê perwerdeyî de bibîne. Ji ber vê yekê dema ku mamoste di derbarê cudatîya nasnameya etnikî de gotinên nexweş dikin, ev yek wekî bînpêkirina mafan tê ditin. Malbat ji ber cudatîya etnik li hemberî dibistanê derdikevin. Li ber vê yekê mamoste jî giliyê ji bor ku zarokan li dibistanê di hundirê sinorê siyasetên nasnameya etnik de bigirin bikartînin. Qelsiya malbatan ew e ku ji bo serkeftina zarokên xwe li dibistanê rê didin van manewrayê mamosteyan.

Zayendîtî zêde nayê axaftin. Zayend di nav malbatê de, etnîsîte li dibistanê, zayendîtî li tu derê nayê axaftin. Mamoste ji ber giliyên li ser zayendîtîyê pirayî azar didin lê belê ew qet behsa vî tiştî nakin. Xwendevan ku bûne magdurê vî tiştî ji bo ku ji vî tiştî xelas bibin rêyên xwe keşf dikin û bikartînin. Piranî dev ji dibistanê berdidin û di bin gotinên malbata xwe de dimînin ji ber ku malbat difikirin ku dev ji dibistanê berdan ji ber bêkêriya wan e. Lêkoliner dibe warekî gili û gazinan dema ku mirov bi hev re diaxivin an jî dema dengê televizyonê zêde dibe û dengê kesî naçe kesekî din.

Materyalê li jor nîşan dide ku gili bi piranî ji aliyê mirovên zêde qels ku qala bêadaletiyê dikin ve tê bi kar anîn. Hestên edaletê yê ku di civakê de hene

gılı û gazinan rewa dike. Gotarên modern yê edaletê balkêşî nakşîne statuya mirovên dixave, lê belê konseptên adaleta gerdişî (geleneksel) balkêşî dixşîne ser cudatîyan. Wer tê hasibandin ku gılı û gazinên mirovên bêhêz wekî bêkêrbun û cahilbuna wî/wê tê qebul kirin. Ji ber vê yekê Xisna biryar daye ku gılı tenê bêqawetbûna wê bide nîşandin. Zarokên Reşat jî dev ji gilikirinê berdane, Gokhan û Evdila jî ji bo gılı û gazinan qet neçûne dibistanê, ji bo bêqawetbuna xwe nebînin jinê xwe şandine dibistanê ji bo gılı û gazinan. Ji ber vê sedemê axaftina bi mamosteyan re tişkî pîrekî ku li malê di bindestê kontrola mêr deye tê ditin. Bi vî yekî, gılı dibe tişteki pîrektî û karek taybet. Gılı kengî wek gazinê tê bikaranîn, maneya wî ya civakî jî holê radibe û dive mijarekî ku di navbera kesan de derbas dibe. Ji aliyê din ve çiqas wek îxbarê were bikaranîn hewqas dibe mijarek siyasî ku kes nikare pê re serî derxe. Lê belê, disa jî gılı wekî taktikekî rê li ber pratikên civakî û meseleyên newekhevîtiyê vedike û derdixe holê. Wekî hemu taktîkan encamên gılıyan jî demek kin didome û nikare zêde li hemberî sistema polîtîk a ku tê deye bisekine.

Xulasa (Encam), nêrina li giliye nîşan dide ku tiştên di jiyana rojana de nayê axaftin tîne zimên. Em dikarin bêjin ku li nêrina kî dikare kî gılı bike, mimkune ku meriv dikaribe xariteyek têkilîyên hêzî derxe. Û me dit ku gılı tiştên ku di nav dibistanê, malbatê û civakê de nayê axaftin tîne ziman. Malbat jî ber ku dixwazin ji zarokên xwe re peşerojkî çêtir ava bikin têkilîyên li dibistanê din av malbatê de tîne axaftin. Lê belê her çiqas tiştên ku nayên zimên wexta bi saya gilyan werên axaftin jî kesên ku gılı dikin disa jî wekî pîrêkekî tîne ditin.